

**PDKÎ weke Komara
Kurdiştanê berhemeke
mayînde ye ji bo Kurdan!**
»»» R:7



**Jeopolîtîka
koloniyozîzmê**
»»» R:2



Agirî

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (405) 08-09-2021 Buha (1000) Tûmen

**Rev li min,
top û tank bo te**
»»» R:5



**Girîngiya bihêzkirina
îradeya gelê Kurd**
»»» R:8



Kabîneya Reîsî û herifîna zûtir a pêgehên civakî yên rejîmê

Pîştî derbasbûna neh rojan ji rêûresma sundxwarina “Îbrahîm Reîsî”, navbirî listeya Wezîrên pêşniyarkirî ên xwe da meclîsa yazdehem, lîstek ku ji aliyekê ve lawaziya kabîneya nû dide xuya û ji aliyê din ve îdia û propagandeya “Îbrahîm Reîsî” li derheq pêkanîna dewleta “serweyî aliyan” û pêngavhilgirtin ber bi yekîtiya netewî ve kire bilqên ser avê.

Bi mêzekirineke kurt û lezgîn li ser derbasbûya wezîrên nû, tê xuya ku piraniya kesên ku di meclîsê de hatine pesendkirin ew kes in ku li nav xeleta berteng a kesên nêzî “Elî Xamîneyî” ne ku di rastî de hêcetanîn, cîbicîker, birêveber û çavedêrê helwêstên Welîyê Feqîh li hemû astên siyasî, aborî, leşkerî, çandî û pêwendiyên navnetewî de ne.

Eva ku piraniya karnas û çavedêrên karûbarên Îranê li ser rîjd û yekdeng in, ev rastîya ye ku ew girûpa karî ne bi tenê nikarin krîzên mezin ên ku rejîma Îranê rastî hatiye çareser bikin, belkî bixwe dibine sedema geşekirina zêdetir a wan krîzan.



Kabîneya sêzdehem di halekê de hevsarê birêvebirina Îranê û rejîma deştilatdar girtiye deştê xwe ku ew welate digel mezintirîn pîrsgirêk û arîşeyên dîroka hevdema xwe rû bi rû bûye. Krîzên hemû rengan û cur bi cur ên aborî, siyasî, civakî, jîngehî, birêveberî û ... ku her yek ji wan karlêkerî li ser krîzên din hene û bi hev re bûne sedema afirandina çendîn krîzên mezin, herwisa bûne sedemek bihêz bo vê yekê ku di asta navxweyî de zêdetir bibe sedema bawerpênêkirina giştî bi Reîsî û kabîneya wî.

Bilî pîrsa nemana baweriya giştî ya civaka Îranê bi rejîma deştilatdar bi taybet piştî qewimîna bûyerên wan çend salên derbasbûyî yek ji girîngtirîn ji wan pîrsane ye ku pêsîra kabîneya sêzdehimê girtiye, xweşt û daxwazên Civaka Navnetewî ji Tehranê heta niha bê bersiv mane. Çend rojan berî niha nûnerê taybet ê Amerîka li karûbarên Îranê, “Rabêrt Malî” tevî îşarekirin bi vê yekê ku ji aliyê dewleta Îranê ve heta niha ti nîşane an hêmayek li derheq deşpêkirina danûstandinan vernegirtine ragihand: “Dewleta Biden nikare heta heta çavniherê Îranê be ku bo zindîkirina Bercamê bizivire ser masê danûstandinan”! ji aliyê din ve jî dewleta nû ya Îsraîlê li derheq metirsiya Komara Îslamî ya Îranê li ser hêlê ye û her wekî Serokwezîrê wî

welatî “Neftalî Bênet” di 12ê Xermananê de ragihandibû: “Bi cihê şerkin bo Bercamê, zom kiriye li ser sestratejiya berfireh li dijî Tehranê”.

Ew rewşe, wate rewşa perîşaniya navxweyî û rewşa perîşanbûn li derve, bihevre û bi liberçavgirtina wê kabîneya lawaz ku “Îbrahîm Reîsî” pêşniyar kiribûn, karlêkeriyeke wiha hene ku Komara Îslamî ya Îranê dexe bin givaşên çend beranber, lewma dewleta Reîsî bi deştê vala û kore rêya setrejtîk û taktîka Xamîneyî zêdetir bo xelkê asayî bide nîşandanê û her wekî hate gotinê, pêgeha civakiya rejîmê zûtir ji vê yekê ku çavniherî tê kirin, biherifîne.

Di vir de careke dinê vê rastîyê dide xuya ku pazêla herifîna rejîma “Wilayeta Feqîh” tevav nabe û meger eva ku opozîsiyonek yekgirtî heta eger gelek bihêz jî nebe, bê meydanê û bikare baweriya giştî hem li navxwe û hem li derve bo aliyê xwe rakêşe û cihê vala yê deştilata piştî herifîna rejîmê, bibe alternatîf.

Peyama hevxemiya Lêpirsiyarê Giştî yê PDKÎ digel xelkê Kurdistanê

Mistefa Hicrî, Lêpirsiyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê derheq bûyera hatinûçûna mînîbosekê ku çendîn welatîyên Rojhilatê Kurdistanê canê xwe ji dest dan û birîndar bûn, di peyamamekê de hevxemiya xwe digel xelkê Kurdistanê nîşan da.

Deqa peyamê wiha ye:

Mixabin karesata bûyera hatinûçûnê, canê hejmareke zêde ji xelkê bajarê Merîwanê stand û ew bajare û tev Kurdistan xembar kir. Xirabiya rêûban li Kurdistanê û pêranegihîştina rejîmê bi



wê karê, salane canê gelek kesan tê standin.

Em bi boneya wê karesatê sersaxiyê li malbata qurbaniyan û xelkê bajarê hezkirî yê Merîwanê û tev Kurdistanîyan dikin û hêvî dikin ku kesên birîndarbûyî bi zûtirîn dem baş bin.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Lêpirsiyarê Giştî

Mistefa Hicrî
11'ê Xermanana 1400'an
2'ê Îlona 2021'an

Daxuyaniya Dezgeha Femandehî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê bo şehîd Osman Mistefapûr

Deزgeha Femandehî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê li derheq şehîdbûna "Osman Mistefapûr" daxuyaniyek belav kir û dax û kesera xwe bo şehîdbûna wî têkoşerê xw-eragir nîşan da.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Daxuyaniya Femandehiya Hêza Pêşmerge Kurdistanê bi hilkefta şehîdbûna heval "Osman Mistefapûr"

Em bi dax û kesereke zêde ve radigehînin ku dilsozê nîştîman û têkoşerê kevna-er Hizba me û pêşmerge ro-jên dijar, "Osman Mistefapûr" sibêdeha 16'ê Xermanana 1400'an a Rojî, bi sedema petaya Koronayê li nexweşxaneyê çû nav refên karvanê serbilind ên şehîdên nîştîmanê.

"Osman Mistefapûr" kurê Husên û jidayikbûyê 1346'ê Rojî û xelkê gundê "Kas-ekeran" ê ser bi devera Pîran a Pîranşehrê bû. Navbirî di temenê 7 saliyê de diçe dibistanê û heta pola sêyem a navendî xwendina xwe di-domîne.

Hejarî û destkurtî nahêle



heval "Osman" xwendina xwe berdewam bike û lewma wek piraniya zarokên Kurd ên ku ji xwendinê dûrkevîne, bi neçarî ve dev ji xwendinê berdide û tevî malbata xwe mijûlê kar dibe, da ku bikare bijîva jiyana malbata xwe dabîn bike.

Bi hatina gorê ya guherinkariyên di sîstema siyasî a desthilatdariya Îranê de, û hatina serkar a Komara Îslamî û derkevîna rûyê raşteqîne yê wê desthilatê, û herwisa serhildana xebata nû a gelê Kurd bo bideştveanîna armancên netewayetî ên xwe, "Osman Mistefapûr" li sala 1364'ê ber bi refên Hizbê ve tê û di Hêza "Qendîl" de tê rêkxistinkirin.

Heval "Osman" li sala 1367'ê bo meimûriyeteke diyarîkirî diçe nav Hêza Agirî û li sala 1370'ê di dema wegerîn ji meimûriyetê li bajarê Urmîyê dikeve boşeya hêza dujmin û piştî şerekî qehrimanane tê dîlgirtin û piştî 28 sal xweragirî û berxwedanî li dijî celadan û îşkencekerên Komara Îslamî dizavire nav refên Hêza Pêşmerge Kurdistanê û heta dema

şehîdbûna wî, dilsoztir û hogirtir ji caran dirêje bi erkên Hizbî û nîştîmanî da.

Hevalê xebatkar û têkoşer şehîd "Osman Mistefapûr" pêşmergeyekî bi bîr û bawer û xemxwarê gelê xwe bû, taybetmendiyên şoreşgerane û têkoşana wî ya bê sekînan-din a wê midehê ku di girtingehên Komara Îslamî de bû, kevte ser zimanê me hemûyan û piştî wegerîna wî nav refên şoreşgerên Demokartê, bi bêhneke germ ve deşt avête xebat û têkoşinkirinê, her lewma ji aliyê Dezgeha Femandehî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê ve pileya kadrê leşkerî pê hate dan û li Dezgeha Rêkxistina Giştî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê hate sazmandehîkirin, û di vir de erkê xwe bi baştirîn awa bi rê ve bir.

Riha wî şad be û berde-wamiya rê û rêbaza xwe bo hevçeperên xwe bicih hêşt. Dezgeha Femandehî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê

16'ê Xermanan 1400'an a Rojî

7'ê Îlona 2021'an

Navenda Hevkarî derheq gefên rejîma Îranê daxuyaniyek belav kir

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê li derheq gefên rejîma Îranê daxwaz li hemû aliyekê kir ku sînorekê bo zêdexwaziyên wê rejîmê danên û bi helwêst û kiryarên xwe li hember wê hewla têkderane ya rejîma Îranê bisekînin.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:
Daxuyaniya Navenda Hevkarî derheq gefên rejîma Îranê

Xelkê xweragir ên Kurdistanê!

Part û aliyên siyasî ên xebatkarên Kurdistanê!

Civaka Navdewletî!

Pêka agehdariyekê ku di ragihandinan de hatiye belavkirin, Spaha Pasdaran a terorîst a rejîma Îranê li berdewamiya karnameya reş a pir ji tawan û êrîş û kavilkariya xwe de, gefa vê yekê xwariye ku binke û baregehên Partiyên Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê wan ve dibe bi armanc û li wan dixe.

Ji kesê veşartî nîne ku ew cihên rejîma Îranê gefa lêdana wan dixwe, cihê jiyana penaberên siyasî û xelkê medenî û ji wan sedan jin û zarokên penaberan in ku bi sedema siyaseta mirovkujane û serkutkarane ya wê rejîma azadîkuj e ku ax û welatê xwe bi cih hêlane û li Herêma Kurdistanê akincî bûne.

Ji aliyek dinê ve jî hebûna xebatkarên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê li Herêma Kurdistan tenê hênceteke piçûk e bo kavilkari û mudaxilekirina rejîmê û di rastî de Komara Îslamî bo dijayetîkirina maf û hebûna netewa Kurd çî hewceyeke wê bi vê nîne ku dijayetiya hereketên Rojhilatê Kurdistanê bike hêncet, çimkî em hemû dizanin pirsgerêka wê rejîmê digel aramî, tenahî û pêşkevtina Herêma Kurdistanê û parçên din ên Kurdistanê ye û di wan waran de jî ku pêwendiyê wisa bi Partiyên Rojhilatê ve nebûye, ew dujminkariya rejîma Îranê li derheq gelê Kurd her hebûye û di paşerojê de dê her bibe.



Xuya ye eva yekem car nîne ku Komara Îslamî a Îranê bi hejandina sînora û binpêkirina serweriya welatên cîran, gefê li can, mal û samana xelkê medenî û çêkirina fitne di deverê de dixwe û ew rejîmê bi afirandina karesat û kuştin û teror û tawana dijî mirovayetiye xwe girtiye û nasnameya xwe digel krîz û nearamiyê girê daye.

Ew gefane di demekê de ne ku Herêma Kurdistanê û Îraq ber bi hîlbijartineke giştî ve diçin û tev hewla berpirsên siyasî û aliyên Hizbî û hikûmetiyên wî welatî û civatgeha navdewletî û nemaze hêzên hevpeyman, dirûstkirina asayiş û aramiyê ne bo birêvebirina piroseya siyasî ya hîlbijartinan di Îraqê de û ew gefa rejîma Îranê dibe hewleke dujminkarane bo

têkdana rewşa siyasiya dever û navhevdana keşa siyasî bi merema hêsdankirina mudaxileyên xwe li wan derane. Komara Îslamî di navxweyê welat de rastî dehan krîzên bêçareserkerî hatiye û di heyama temenê xwe de wisa hîn bûye ku bo xwedizîn ji çareseriya krîzekê, krîzek din biafirîne. Her lewma wê carê jî bi mifahwergirtin li rewşa siyasî ya deverê û sebrkirina Civatgeha Navdewletî li hember tawan û destdirêjiyên wê, ew wisa dizane ku bi çavsorkirin li xelkê medenî û gefxwarin li mal û halê penaberên siyasî, dikare bandorê li ser îradeya siyasiya netewa Kurd û rêxirawên xebatkar ên wê danê û bigihe bi armancên xwe ên qirêj.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê tevî

şermezarkirina gefên rejîma Îranê, li hegera rûdana her haleteke neasayî de ku bibe sedema ziyangihandin bi mal û halê xelk û her cure tawanek li dijî mirovayeti û ziyangihandin bi jîngeha Kurdistanê, Komara Îslamî a Îranê bi berpirsiyar dizane û daxwazê li bîrûraya giştî ya xelkê Kurdistanê, hikûmeta Herêma Kurdistanê û Îraq û Civatgeha Navdewletî dike ku sînorekê bo zêdexwaziyên wê rejîmê danên û bi helwêst û kiryarên xwe, li hember wê hewla têkderane ya rejîma Îranê bisekînin.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê

15`ê Xermanana 1400`an a Rojî

6`ê Îlona 2021`an



Rev li min, top û tank bo te



N: Serbest Urmiye

Şerê li Efxaniştanê yek ji domdirêjtirîn şerên dîroka hevçerx a Emerîkayê tê hesabandin. Piştî bûyera 11'ê Sêptember a 2001'an, ku hêzên Emerîkayê bi merema şer li dijî terorîzmê û ji holêrakirina taqîma tundajo û terorîst ya El- Qaîde êrîşî ser taqîma Talîbanê kir. Hêceta Emerîkayê bo wî şerî li dijî Talîbanê, bûna serok û birêveberên El- Qaîdeyê bû di herêma di bin deşhilata Talîbanê de.

Encama şerê han ku nêzîk bişt salan e didomîne û niha ber bi lawazbûn yan renga nemanê ve diçe, li gor ya ku hatiye ragihandin, ji bilî kuştina bi sedan welatîyên sivîl, 23 hezar kuştî û 20 hezar birîndaran e ji aliyên şer. Helbet hin şirovekar di vê baweriyê de ne ku hejmara han li dor kuştî û birîndaran kêmtir ji hejmara raştî hatiye ragihandin. Helbet hin çavkaniyên Efxaniştanê ji bilî hêzên paraştina tenahiyê û polîsên Efxaniştanê, pitir ji sed hezaran didin zanîn.

Ji bilî xwînê, xerceke giran a aborî jî kete ser deştê dewletên yekbûyî yên Emerîkayê ku li gor raporta navenda "Costs of War", Emerîkayê di heyamê 20 salên derbasbûyî li Efxaniştanê de, 2 tiriliyon û 260 milyard Dolar ji deşt daye. Herwiha Wezaretê Berewaniya Emerîkayê jî di ragihandineke xwe de îşare bi 815 milyard û 700 milyon Dolaran dike ku vê Wezaretê di Efxaniştanê de xerc kiriye. Serbarê hemû xercê xwêna han, di helwêseteke cuda de, Emerîka hewil dide ku guhertineke berçav bîne rojevê û bi terzekê barê ser milî



xwe sivik bike. Di heyamê serokatîya "Barack Obama" de û bi vê hêcetê ku nikarin bi rêya leşkerî ve tenahiyê wegerînine Efxaniştanê, aliyê gotûbêjê tevî taqîma Talîban deşpêkirin. Gotûbêjên han heya serokatîya "Donald Trump" jî bi terzekê berdewam bû, her çend ku encameke berçav a erênî jê dernekevt, lê biriyar hatibû girtin ku di heyamê 14 mehan de leşkerên Emerîkayê li Efxaniştanê paşve bikeşin.

Merema Emerîkayê ji paşvekeşiyana han çî be, aliyê pirsê ye û encama paşvekeşiyane aliyê nîne. Li dor vê pirsê de şiroveyên cuda hene ku basa aliyên cuda dikin. Hin şirove dibêjin ku yek ji armancên Emerîkayê sernekevtina aliyê leşkerî bû di pêvajoya wegerandina aştîyê bo Efxaniştanê. Aliyên din hene ku bi bawer in ku merema Emerîkayê ji biriyara han, sekinandina xerceke zêde û giran him di aliyê maddî û him di aliyê aborî de bû ku encameke wisa erênî jî heya niha jê derneketibû. Hin şirovekar jî didine zanîn ku merem ji paşvekeşiyana han deştêkirina şerekî bi wekalet e û anîna Turkiyayê bo nava vê pêvajoyê û espardina kontirola firokexaneya Kabulê bi wî welatî, weke faktor tînin. Baseke din ku di vê derheqê de heye, qala kontirolkirina Îran, Çîn û Rûsiyayê ye. Li

gor şiroveyan, siyaseta nû ya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê, kontirolkirina her sê welatan navbirî ye bi alîkariya hevalbendiya Austiraliya, Hind û Japûnê. Bi siyaseta han Emerîka hewil dide him bi şereke bi wekalet di herêmê de hebe û him jî aliyên maddî û leşkerî yên xwe ji zirara zêde biparêze.

Encam:

Encama ra û şiroveyên han her çî be, heya niha derheq Îranê bi vec bûye. Ji ber ku piştî vekîşiyana arteşa Emerîkayê û dagîrkirina Efxaniştanê ji aliyê Talîbanê ve ya ku hatiye zanîn, ji xêncî radeyeke zor ji kereşteyên teknîkî û teknolojiya zaniyariyan, bi qaseke zêde alav û teknolojiya nûjen a şer a arteşa reviyayî, ketiye deşt taqîma dagîrkar. Li gor texmînan ji sala 2003'an heya 2017'an, 75 hezar û 898 mekîneyên nefer hilgir, 599 hezar û 690 heb çekên şer, 162 hezar û 643 alavên peywendî girtinê, 208 firoke û 16 hezar û 191 alavên vekolîn û şopandinê, ji arteşa Emerîkayê li Efxaniştanê re hatine şandin. Sala 2017 heya 2019'an jî, di gerreke din de dîsan nêzîk 7 hezar heb çekên şer, 4 hezar û 702 mekîneyên nefer hilgir, nêzîk 20 hezar narincokê deşt, 2 hezar û 500 bombe û yek hezar û 394 narincokhavêj, ji hejmara han hatine zêde kirin

ku tin ketine deşt Talîbanê.

Di çen rojên borî de hin çavkaniyan bi weşandina hin wêneyan, êskere kirin ku hejmareke zaf ji kereşteyên Emerîkayî ku piştî paşvekeşiyane ji Efxaniştanê ketibûn deştê taqîma Talîbanê û bo Tehranê hatine veguhas-tin. Her çend ku çavkaniyên han nadin kifşkirin ka gelo kereşteyên han raştewxwe ji aliyê Talîbanê bo Îranê hatine dayîn yan aliyê Arteşa reviyayî ya Efxaniştanê ve, lê tişteke wisa ji giringiya pirsê ji Îranê re kêmtir nake. Ji ber ku niha teknolojiya nûjen a şer ku Emerîka li hember Îranê de bo hempa dikir, her çiqas kêmtir jî be, hem ji aliyê maddî ketiye deşt rejîma Îranê û him jî dikare bibe deştê ji bo ku pisporên leşkerî yên Îranê di pêşvebirina zaniştê xwe ya şer de mifahê jê wergerin. Wate heya niha biriyê meydana hatin û reviyana Efxaniştanê Îran bûye. Helbet qonaxên pêşerojê de encam dê bibe çî, wê demê vedigere guhertina nû ku piştî hatina Talîbanê di Efxaniştanê de çêdibe û helwestên navneteweyî li hember Talîbanê. Ji ber ku tecrûbe didin xuyakirin ku çiqas hewleştên navneteweyî li hember taqîm yan dewletekê de tund û micid bin, evqas Îranê mihaf jê wergirtiye û kiriye alavê deştê xwe.

Bê welatî û bandora wê li ser pirsê jinan



N: Sîmîn Rûhanîzade

Welat ew çarçove û cu-grafiyaye ye ku divê her neteweyek bi awayek fermî xwediyê wê çarçovê û cu-grafiya diyarîkirî be. Dema ku neteweyek xwedî welat nebe yan welatê wê hatibe dagîrkerin, ew netewe bi awayên cur bi cur raştî arîşeyan tê, û pêşketin û geşekirina wê netewa bê welat dibe pirsîgirêkek mezin bo ser civaka wê netewê. Ger bas li pirsîgirêkên jinan di nava civakê de bê kirin dîrokek dûr û dirêj heye ku pêwendî bi çand û kultûra wê civakê ve heye.

Eger em çav ji wan pirsîgîrekan di welatên din de bitaybet welatên pêşketî û demokratîk de bikin, em dibînin ku jin di wan welatan de karîne beşek herî zêde ji serweriyên xwe bi dest ve bînin û biparêzin, lê di welatên paşketî bi taybet di Rojhilata Navîn de, ew tişt nayê xuyakirin û pirsîgirêkên mezin li ser rêya jinan heye ku eva jî girêdayî ye bi perwerde û kultûra wê civakê û guhîrîna bingehîn a wan cure civakane piroseyek dûr û dirêj e.

Di vir de em dixwazin bas li Kurdê bê welat û civaka kurdewarî bikin û bizanin sedemên sereke ên wan paşketinane çi ne û çima perwerdeya civaka me siqet maye?

Bo baskirin li pirsîgirêkên jinan di civaka Kurdî de em aliyê dîrokî û civakî berçav digirin û dixwazin bizanin pêgeha jinan li warê siyasî, aborî û karûbarên civakî di civaka Kurdî de çawa ye û di çi asteke de ye û heta çi asteke serbixwe ye û şiyana vê yekê heye ku li hember



mafên xwe derkeve û...hwd. Netewa kurd bilî "Başûrê Kurdistanê" ku xwedî deştîlatek federalî ye, neteweyek bê hikûmet û dewlet e, û ji hebûna fermî a zimanê xwe bê para maye û her neteweyek ku bi zimanê xwe, dîroka xwe û bi awayek serbeşt nehatiye perwerdekirin, rewşa civaka wê baş nabe û nikare di warê siyasî, aborî û karûbarên civakî de serbixwe be û heta nikare ji mafê xwe xwedî derkeve, çimkî ev yekên ku me basa jê kirin hewce bi gel û çarçoveyek serbixwe heye û ger gel bindest be bê guman geşekirin di nava wê gelê de jî raştî astengên mezin tê.

Dema bas ji bindestiyê dîkin çend cur bindestî hene, siyasî, civakî, aborî, olî û malbatî û...hwd, mebest jî bindestiyê jî eva ye ku kesek nekare bi eqilê xwe bifikire û li ser jiyana xwe biriyarê bide û di vê halê de jî mafên wan yê bingehîn ji aliyê kesek din ve tê bînpêkirin.

Dema kesek serbixweyiya siyasî nebe bi vê wateyê ye ku ji nasnama netewî hatiye bîparkirin û dema kesek jî ji nasnameya xwe bîpar

dimîne, nekare di warê civakî û yasayî de li ser jiyana xwe biriyarê bide û di vê halê de mirov ji serbixweya xwe bê par dimîne û dikeve bin rikêfa ew bindestiyane ku di nava civatgehê de heye û jiyana wê dikeve nava çarçoveyek teng û diyarîkirî ku ji aliyê kesek din ve bo wê/wî hatiye diyarkirin. "Di vir de jin û mîr cudahî nîne, lê rûyê min li ser rewşa jinan di wê civakê de ye".

Herwisa ji aliyê aborî ve jî wisa ye, ew civaka ku parema ye ji her cure pêşketinekê, bê guman derfetek wisa nehatiye afirandin bo jinan ku bikarin kar bikin û ji warê aborî ve serbixwe bin, dema ku serbixweyiya aborî jî nebe jin dikeve bin rikêfa bav, bira, hevjin û...hwd, ku eva xwe jî arîşeyek e.

Ji qedîm-zeman ve jin di Rojhilata Navîn de bitaybet di Kurdistanê de girêdayî bûye bi ol û dabûnerîtek mîrsalar, û ev du xalane hukim bi ser jinan de kiriye, û ji perwerde ve bigire heta pêkanîna jinyana hevbeş, hemû di bin rikêfa wan duyan de bûye, û kultûra Kurdewarî jî di dirêjahiya dîrokê de guherîn bi ser de hatiye, çimkî Kurd bixwe serbixwe nebûye û bi berdewamî ketiye bin bandora kultûra ew deselata ku hakim bûye li ser de û bi wê sedemê jinên Kurd di nava civakek daxistî û bindest de bûne.

Parçe-parçebûna welatê me li ser pirsê jinan jî astengî û arîşe çê kiriye, bi awayekî her beşek ji Kurdistanê ketiye bin bandora deştîlata dagîrker de û dîtingeha wan li ser jinan cuda ye. Bo mînak li Rojhilatê Kurdistanê bi awayekî çav li pirsê jinan dîkin, li Bakurê Kurdistanê bi awayekî din û li Başûr û Rojavayê Kurdistanê jî bi awayekî din û herwisa li ser perwerdekirin jina ji bandor heye.


Lê dîsan jî tevî hebûna wan hemû astengî û nebûa welatek serbixwe û yekgirtî û perwerdeyek rêkûpêk, gelê me gelek keç û jinên wêra û netirîs û jîr hene û hebûne ku karîne li hember wan pirsîgirêkane derkevin û dengê xwe bilind bikin û ew bindestî û bînpêkariyan qebûl nekin û şerê henûa welatê xwe dîkin heta ku nifşa nû nebe qurbaniye wê bê welatîyê.

Nerîna Lîderan



“Kawe Behramî”:

“Ez dikarim bêjim %80 xelkê Kurdistanê Hêza Pêşmerge Kurdîstanê ne û ev di navxweyê welat de li hember rejîma Îranê helwêstê digrin”.



“Joe Biden”:

“Çîn, Rûsiye, Îran û Pakîstan li pey rêkvevtin digel Talibanê ne”.



“Josep Borrell”:

“Herêma Kurdistanê faktoreke girîng a aramiya navçeyê ye”.



“Jens Stoltenberg”:

“Îran û Koreya Bakur mijûlê geşedan bi teknolojiya metirsîdar a mûşekan in”.

PDKÎ weke Komara Kurdistanê berhemeke mayînde ye ji bo Kurdan!



N: Eskender Ceiferî

Roja 22'ê Kanûna Paşîn a sala 1946'an a Zayînî angû 2'ê Rêbendanê a sala 1324'an a Rojî, Komara Kurdistanê ji aliyê Qazî Mihemed ve li meydana Çarçira li bajarê Mehabadê yê Rojhilatê Kurdistanê hate ragihandin û wê hikûmeta Kurdî, ala netewî ya Kurdistanê hilda. Di vê rêwresmê de Qazî Mihemed wiha sûnd xwar: “Bi mezinatiya Xwedê, rûmeta Qurana Kerîm û li ser welat û ala xwe sûndê diwxem heta dilopa dawî ya xwîna min û nefesa min a dawiyê, bi can û malê xwe, di rêya azadiyê de, ji bo ku alên me li esmanan pêl bidin, ezê xebatê bikim.”

Komar, ji aliyê heman partiyê ve hate avakirin ku niha jî piştî vê dîroka dirêj, hîn di xebatê de berdewam e û bûyê şanaziya Kurdan.

Beriya wê jî li vê navçeyê serhildanên Şêx Ubeydullayê Nehrî û Simkoyê Şîkak çê bibûn.

Piştî ku sala 1941'ê Şahê Farsan, Riza Şah bi derbeyekê ket û kurê wî Mihemedriza bû deşhilatdarê rejîmê, wê demê serokeşîrên Kurdan ên ku ji Kurdistanê hatibûn dîrxistin, zivîrîn Kurdistanê û hewl didan deşhilat û rêveberiya navçeyên xwe bi deşt bigirin.

Êdî rojavayê Îranê ketibû bin deşhilata Kurd û Azerbaycanîyan de û Rûsî jî derbasî navçeyê bibûn.

Sala 1942'an li Mahabadê kovara bi navê Nîştîman bi beşdarbûna 11 kesên hate weşandin û weke rojnameya fermî ya Komeley Jiyanewey Kurd (Komeley J.K) hate binavkirin û li ser heştê netewî ya Kurdan kar dikir. Navê



vê komeleyê di hate wateya vejandina Kurdan. Piştî sê salan di sala 1945'an de bi pêşengiya Qazî Mihemed, Komeleyê dewsa xwe da Partiya Demokrat a Kurdistanê û daxwazên vê partiyê, xweserî, perwerdeya bi zimanê dayîkê, fermîbûna zimanê Kurdî û gelek xwestekên din jî bûn.

Ji bilî Komara Agirî li Bakur û hikûmeta Şêx Mehmûd Berzencî ku li Silêmaniyê hatibû ragihandin, Komara Kurdistanê jî di warê dewletbûnê de ji bo Kurdan bû ezmûneke din. Kurdan êdî ji xwe re şoreşên Agirî, Simko û yên din kiribûn mînak û waneya berxwedanê ji wan hîn bibûn.

Piştî ku di 22'ê Kanûna Paşîn a 1946'an Komara Kurdistanê hate ragihandin, Leşkerê Kurdistanê angû Artêşa Kurdistanê hate avakirin ku heman Hêza Pêşmerge bû. Ew hêz ji hezaran gencên Kurd û ji leşker û hêzên wan eşîran pêk dihat ku tevî Komara Kurdistanê bibûn û her du hêzên siwar û peya lixwe digirtin.

Komara Kurdistanê ya ku li Mehabadê bi Serokkomariya Qazî Mihemed hate ragihandin, çarde wezîr jî lixwe digirtin ku ev in; Serokwezîr: Hacî Baba Şêx, Wezîrê Karûbarên Navxwe: Mihemed Emîn Muînî, Wezîrê Karûbarên Derve: Ebdulrehman Îlhanîzade, Wezîrê Şer û Paraştinê: Seyf Qazî, Wezîrê Daraiyî: Ehmed Êlahî, Wezîrê Dadê: Mela Husên Mecdî, Wezîrê Rêûbanan: Îsmail Îlhanîzade, Wezîrê Ragihandinê: Sidîq Heyderî, Wezîrê Post, Tele-

fon û Telegrafê: Kerîm Ehmedeyn, Wezîrê Perwerdehî û Fêrkirinê: Menaf Kerîmî, Wezîrê Kar: Xelîl Xûsrevî, Wezîrê Ticaret û Bazirganiyê: Hecî Mîstefa Dawûdî, Wezîrê Tendurîstiyê: Seyîd Mihemed Eyûbiyan, Wezîrê Çandiniyê: Mehmûd Welîzade. Wan wezîran, yasaya Komarê zelal kirin.

Di dema yazde mehên temenê Komara Kurdistanê de gelek rêxistinên aborî, leşkerî, civakî, sîstema perwerdehiyê, çandî, wêjeyî, hunerî, şanoya Kurdî, saziyên ji bo paraştina mafên jinan jî hatin pêkanîn, çapemenî hebûn û zimanê Kurdî jî bû zimanê fermî. Ev berhem û gelek berhemên din û herwisa Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê PDKÎ, ji mîratên Komara Kurdistanê ne ku heya îro jî li dijî dagirker xebatê dike.

Aboriya Komara Kurdistanê li ser bac û ticaretê birêve diçû bi rengekî ku komîsyonekê li navendên bajaran bac ji tacir û bazirganan distand û komîsyonekê jî di rêya axayan re baca gundewaran kom dikir. Herwisa Komara Kurdistanê bixwe jî çalakiyê bazirganî û ticaret dikir ji bo ku dahata pêwîst ji bo xercên hikûmetê bi deşt xwe ve bîne.

Hêzên Rejîma Şayê Farsan, bi deşteka Berîtanyayê di roja 17'ê Kanûna 1946'an de, leşkerên xwe birin aliyê Kurdistanê. Ji bo ku xelk neyê komkujkirin, Qazî Mihemed, berdewamkirina riya xwe, sparte hevalên xwe û êdî komar hate hilweşandin û Qazî Mihemed xwe radeşt kir.

Girîngiya bihêzkirina îradeya gelê Kurd



N: Ebdûlazîz Qasim

Helbet vekeşîna hêzên Amerîkî ji Efxaniştanê, û hatina tevgera Talîban li ser desthilatdariyê wî welatî, gelek pirsyar li dora xwe çêkirin, nemaze li welatên ku bêtê piştgiriya navdewletî nikarin xwe birêve bibin, lewra hevdem li gel vekişîna hêzên Amerîka ji Efxaniştanê, ev yek ji aliyên neyar û dijminên gelê kurd wekî gefxwarin li dijî gelê kurd hat bikaranîn, tevî ku ji aliyê Amerîka ve heta niha tiştek wisa nehatiye ragihandin, berovajî ku tê pêşbînîkirin, ku hêzên Amerîka bo demeke dirêj li Sûriyê bimînin, bêhtir ji bo paraştin û ewlehiya Îsraîlê.

Ji aliyek din ku vekişîna hêzên Amerîkî ji Efxaniştanê, huşdariyek di nav tevaya civaka kurdî de peyda kir, ji ber vê yekê ji aliyê rewşenbîr, û kesayetiyên civakî û siyasî yên

serbixwe zengilê huşyardariyê hate lêdan û dubare daxwaz bo girîngiya serxistina diyaloga kurdî- kurdî hatin nûkirin, ku îro her çawa be divê kurd vê derfetê jidest nedin, nemaze ku diyaloga kurdî-kurdî bi serpirştîya Amerîkiyan dibe, mixabin ku roj bi roj astengi-yên mezin dikevin di rêya wê de.

Dihat çaverêkirin ku alîkarê wezîrê derve yê Amerîka, Joey Hood li gel nûnerê Amerîka li bakur û rojhilata Sûriyê, David Brownstein ji berî çend rojan serdana kurdistana Sûriyê bike ji bo destpêkirina diyaloga di navbera ENKS û PYD de, lê ew serdan bo demekî nediya hat paşxistin.

Em hemû dizanin, ku rewşa gelê kurd ketiye di metirsiyek mezin de, bêhtir ji 50% ji millet koçber bûye, nêzîkî 50% ji xaka kurdistanê ji aliyên Tirkîyê û çeteyên terorîst yên Îtilafê ve hatiye dagîrkirin û ji gelê kurd hatiye valakirin, heta niha ne ji aliyê PYD û ne ji aliyê ENKSê ve ti danpêdanek bi mafên gelê kurd yên netewî nehatine bidestxistin!!!

Di van şert û mercên dijwar de, dibe ku hewlên Amerîka



serbikevin ji bo pêkanîna rêkeftinekî di navbera aliyên kurdî de, ku em hêvîxwazin ev yek biserkeve, lê heta Amerîka jî bêtê hebûna îradeyeke kurdî ya rasteqîn nikare tiştekî ji kurdan re bikî, ji ber vê yekê ya herî girîng divê em xudan îrade bin û nabe ti aliyek îradeya milletê kurd lawaz bike ji ber wiha dibe pîrsa yekrêziya kurdî bibe armacek herî pîroz û li ser vê yekê îradeya milletê me wê bihêz bibe, îradeyek bihêz pêdivî bi bidawîkirina parçebûn û rawestandina duberekiya siyasî heye, herwiha bi bihêzkirina yekrêza navmala kurdî heye, ku rêya çareserkirina doza kurdî tenê bi yekrêziyê dibe, ji ber wiha heryek ji Rêjîm, Opozisyonê, bi Tirkîye û Îran ve jî bi hemû hewldanên xwe ve wê nahêlin ev diyalog serbikeve, divê îradeya milletê kurd û aliyên wê yên siyasî ji hewldan û planên dagîrkeran bihêztir be heta ev diyalog serbikeve, li pêşiya me ti çare nîne ji bilî yekrêziyê li ser bingehek netewî.

Turkîya çi ji Sûrya û Kurdan dixwaze



N: Emer İsmayil

Ji despêka ku şer beriya heşt salan dest pêkir ji hingê ve Turkîya bi hêsanî nêçirê dike û ji xwe re serzemîn û binzemîna parçine ji xaka Sûrî didize, û rolek girîng di biryar û nêrînên siyasî û nemze opozîsyon bi rengekî gelekî qirêj û gemar bo nimûne bazirganiya wî ya navnetewî bi penaberên Sûrî di bin gefa de ku derî li penaberan veke û berê wan bide Ewropayê bi milyaran dolar ji Ewropayê werdigre;

Di vê derheqê de peyman bi Yekîtiya Ewropayê re wajo kir.

Turkiyayê siyasetek dûrnêrîn li nexşeya nû ya Sûriyayê xebitî û bi sedema paraştina welatê xwe ji DAÎŞ û terorê derbasî xaka Sûriyayê bû û li ber çavan û alîkariya hêzên navdewletî û nemaze Amerîka û li dijî Kurdan û mafê Kurdan di qonaxek dîrokî û girîng de setratîjiya xwe guherî; Eb setratejî eva ye ku nehêle Kurd li hemû parçên Kurdistanê mafê xwe yê netewî û çarenivîdiyê wergirin, ji ber vê yekê êrîşî Rojavayê Kurdistanê kir û bi hemî hêza leşkerî û hêza Hemahengiya Niştimanî ve Efrînê dagîr kir.

Bê guman welatên cîhanê temaşavanê êrîşa wiha ya

hovane û dijwar li dijî Efrînê bûka Kurdistanê bûn, û alîkariya Kurdan nekirin, da ku ew xwe ji talankirin û kavi-likirinê neparêzin.

Dewleta Tirk a dagîrker bi bê rawestan mijûlê guherîna demografiya Efrînê ye û Ereban û Tirkan bi darê zorê li ser mal, xanî û zeviyan bicih dike, bê guman hêzên PYDê a ku binavê paraştina Efrînê şer dike nekarî berevaniyê bike û biraştî û ji ber çavan û bi êşkere Efrîn firotine Turkiyê û ew piştî wêrankirin, bombekirina xanî û kulan û malê hevvelatîyên sivîl, radeştî rejêmê kirin.

Li gor Turkîya (Şoreşa) Sûrî gihîşte armanca xwe, herwiha berdwamiyê dike di



pêşveçûna wê di xaka Sûryê de heta ku gihîşte Minbicê, ew jî bi peymanek bi Amerîkayê re. Ev diyar dike ku di rojên pêş de nexşeya perçekirina Sûriyeyê diyar dike û Tirkîya dixwaze Kurdistana Sûriyê bixe ser xwe û bi peymanek navdewletî armancên xwe pêk bîne.

Dîsan welatî di Rojhilatê Kurdistanê de bûne qurbaniyê bûyerên hatinûçûnê

Bûyerên hatinûçûnê li Îranê û bi taybetî di Rojhilatê Kurdistanê de yek ji wan sedeman e ku rojane canê welatiyan jê distîne.

Hêj heftiyek bi ser bûyera hatinûçûnê ya li bajarê Merîwanê dernab nebûye ku bibû sedema canajidestdana 16 kesan, dîsan li 13ê Xermananê li ser rêya “Sewlawa-Kamyaran”ê 3 kes ên endamê malbatê ku 2 bira û xwîşkek bûn bi sedema bûyera hatinûçûnê canê xwe ji dest dan.

Herwisa di vê derheqê de şeva derbasbûyî li rêya “Rewanser- Pawe” yê jî 3 kesên din ên bi navên “Hisam Ebasî, Adil Mihemedî û Sebah Mehmûdî” bi dijwarî birîndar bûn û pêka zaniyariyan ew 3 kes kolber bûne û rewşa tenduriştiya wan nebaş e.



Ew bûyerên ku bas ji wan hatine kirin bi tenê li heyama heftiyekê di bajarên Rojhilatê Kurdistanê de qewimîne, ku bi gelemper 19 kesan canê xwe ji dest dane û 17 kes jî birîndar bûne.

Rêyên Parêzgeha Kirmaşanê yek ji wan rêyan e ku zêdetirîn rêjeya bûyerên hatinûçûnê heye û pêka amarên rejîma Îranê di 4 mehên destpêkî yên sala 1400an de, bi tenê di wê parêzgehê de 102 kesan canê xwe ji dest dane û 1 hezar û 634 kes jî

birîndar bûne û bi berhevdanîn digel sala derbasbûyî ev amar %12 zêde bûye.

Herwisa bûyerên hatin û çûnê di parêzgehên din ên Rojhilatê Kurdistanê bi berhevdanîn digel sala derbasbûyî %57 zêde bûye û amara canjidestdanan jî %49 zêde bûye û herwisa pêka amaran di 30 xulekan de 1 kes bi vê sedemê canê xwe ji dest dide.

Sedema bingeîn a wan bûyerane bi giştî xirabiya rêyên Rojhilatê Kurdistanê ye ku bi “Rêyên Mirinê” hatine binavkirin û canê welatiyan ji wan distîne, bi gelemper di parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê de wekî “Urmiye, Sine, Kirmaşan û Îlam”ê di 4 mehên destpêka salê de, zêdetir ji 500 kesan canê xwe ji dest dane.

“Osman Mişefapûr” bi sedema petaya Koronayê canê xwe ji dest da

Sibêdeha îro Sêşemî 16`ê Xermananê, “Osman Mişefapûr” girtiyê siyasî yê berê, bi sedema petaya Koronayê, li yek ji nexweşxaneyên bajarê Koyê, canê xwe ji dest da.

Ew girtiyê siyasî meha Bane-mera sala 1399`an, bi sedema givaşa hêzên Îtîla`ata bajarê Pîranşehrê, cihê li dayîkbûna xwe cî hêşt.

Roja Pêncşemî 30`ê Xezelwera sala 1398`an, “Osman Mişefapûr” û “Mihemed Nezerî”, piştî 53 sal girtîgeh, ji girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê hatine azadkirin.

“Osman Mişefapûr” 28 sal û “Mihemed Nezerî” 25 sal di girtîgehê de bûn. Ew du girtiye heyama cezayên xwe li girtîgehên “Urmiye, Tewrêz û Recayîşehrê” derbaskiribûn.

“Osman Mişefapûr”, Pûşpera sala 1370`an li devera “Tirgever” a ser bi bajarê Urmiyê hate binçavkirin û piştî bi tohmata “endambûn li yek ji Partiyên Kurdî yên



dijberî hikûmeta Îranê” bi 25 sal girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan.

Dawiya sala 1392`an piştî 23 sal binçavkirin, taya 1 a dadgeha şoreş a bajarê Urmiyê bi serokayetiya dadver “Çabok”, cezaya girtîgeha “Osman Mişefapûr” bo 35 sal girtîgeha te`izîrî hatibû veguhirîn. Dezgeha dadveriya hikûmeta îslamiya Îranê, cezaya 10 sal bo wî welatiyê Kurd bi sedema şerkirin digel Spaha Pasdaran birîbû.

Koma “Dîlan Urmiye” carek din di asta cîhanê de serkevtin bi deşt anî

Koma hunerî û çandîya, “Dîlan Urmiye” carek din karî di asta cîhanê de serkevtinan bi deşt bîne û di 2 festîvalên cîhanê de pileya yekem bi deşt bixe.

Koma çandî û hunerîya “Dîlan Urmiye” karî di asta cîhanê de û li 2 festîvalên navnetewî, pileya yekem bi deşt bîne, ew girûpa hunerî bi beşdarî kirin di Festîvala “Balkêşên Emerîkayê” li bajarê “Meyamê” ya Amerîkayê û festîvala “Esmana Avûstralya”yê li bajarê “Sîdînî” yê digel koma muzîka zindîya Kurdî serkevtinek din tomar bike, ev 2 festîvalane bi sedema belavbûna vîroşa Koronayê bi awayê “Online” hatibûne lidarxistin.

Eva yekemîn car nîne ku ew koma hunerî wiha dibe xwediyê serkevtinan û pileyên bilind di asta cîhanê û navxweyî de bi deşt tîne.

Di Newroza sala 1397an de bo yekemîn car li festîvala bajarê “Baney”ê beşdarî kiribû û di sala 1398an de carek din bo festîvala “Bane”yê hate hilbijardin û karî pileya Sêyemîn bi deşt bîne.

Koma Dîlan li demsala Havîna sala 1398an di welatê “Ermenîstanê” de karî di beşên dîlan, mûzîk û herwisa ştranbêjiyê de peleyên yekem bi deşt bîne û li sala 1398an di festîvaleke hunerî li welatê Îspaniyayê karî pileya duyem bi deşt bîne.



Ev kome di sala 1400`an de, bi awayekî fermî bû bi endamê Encûmena Folklorî ya Ewropayê.

Koma “Dîlana Urmiyê” di sala 1396an li bajarê Urmiyê ji aliyê çendîn xortên bajarê Urmiyê ve hatiye ava kirin.

Tîpa Hawar çand û kelepûra Efrînê li Stenbolê vedijîne

Tîpa Hawar ev 4 sal in li Stenbolê çand û kelepûra Efrînê dide jiyandin. Tîpa ku ji Efrîniyan pêk tê û di serdema şerê navxwe yê Sûriyê de ber bi Tirkîyê ve koç kirine, di nava jiyanêke penaberî de xebatên xwe yên Kurdewar berdewam dikin.

Ji bo berdewamî û jiyandina hunerê, ji welatê xwe dûr li xerîbiyê penaber bin jî, ligel her cûre astengiyan jî dikarin çand û kelepûra xwe bijîn û raberî seyra civaka xwe û ya cîhanê bikin. Birayê Bavê Salih dengbêjê Kurd ku can daye bi dehan çîrokan û ji ber klamên Kurdî rûbirûyê zilma deşthilata Sûriyê maye Adnan Omer digel malbata xwe li Stenbolê ji bo çand û hûnera Kurdî û berdewamiya kelepûra Efrînê Tîpa Hawar ya govendê damezrandiye. Di nava bê derfetiyan de bêtî gîlî û gazincan dîrî welatê zeytûnan Efrîna rengîn di xaniyekî 2 çav de li bajarê Stenbolê bîra wî aliyê sînor yê Rojavayê Kurdistanê veguheştiye bajarê Stenbolê û li vir zindî dike. Derhênerê Tîpa Hawar Adnan Omer diyar dike, armanca wan ew



e ku çanda Kurdî li vî welatê xerîbiyê biparêzin.

Derhênerê Tîpa Hawar Adnan Omer ji K24ê re got: “Yekem mebeşt me ji damezrandina Tîpa Hawar ew e ku; em kûltûra Kurdî biparêzin yek, a duyemîn jî em karibin çî kûltûrê me yê Kurdî, ev bazdanên me, ştranên me ew di pêşerojê de em karibin wan qeyd bikin, biparêzin û bihêlin ji nişê nû re. Zehmetî piçekî di warê aborî de heye em nikarin cihekî ji xwe re bigirin, kirê bikin em tê de provayên xwe bikin. Lê di mala me de em dikarin bi çend endamên komê hazir bibin ev reqs û semayên xwe werbigrin û dakevin govend û dîlanan berdewam bikin.”

Endamên Tîpa Hawar, xwediyên bê nasname yên welatê zeytûnan ji mala xwe bi hezaran kîlometir dûr wek wan kevokên aştiyê yên mizgîniyê ku nîşaneya vejandina çand û hunera 7 hezar sali ya Efrînê tê zanîn li vî bajarê pirçand û pirziman li Stenbola serjimarê wê 16 milyon kes e bi rêya govendê çand û hûnera xwe raberî her cûre milletî dikin û bi wan didin nasîn. Rewşan Omer jî Perwerdekara Tîpa Hawar dibêje; wan hîç bîra wê yekê nedibir ku wê piştî şerê li Sûrî tîmekê ava bikin û çanda Kurdî li Stenbolê bidin jiyandin ligel hemû zehmetiyan.

Rahênera Tîpa Hawar Rewşan Omer ji K24ê re got: “Ez di temenê 14 salî de bûm li Helebê, Ez tevlî Koma Ne-

wroz bûm. 3-4 salan di koma Newroz de mam di pêre jî ez tevlî Koma Hawar bûm. Di wir de jî me bazdan dikir. Di pey re ez hatim rewşa Sûrî deştêpêkir, şer deştêpêkir. Pê re em hatin Tirkîyê. Lê qet li bîra min ne çû em dê li vir komeke bazdanê ava bikin. Ji ber ku li vir rewş gelekî zehmet e. Me li vir Tîpa Hawar çêkir, me deşt bi karê xwe kir. Ev e bû 3-4 sal in em wekî tîpa hawar li vir derdikevin dawetan, şahîyan Klîpan û gelek klip me bi hunermendan re jî çêkir.”

Tîpa Hawar ev 4 sal in ku li dawet û şênîyan û di rojên Newrozê de bi govenda xwecihî ya Efrînê, çand û hûnera Kurdî ya hatiye jibîrkirin û bê xwedî maye raberî dikin. Tîpa Hawar di heman demê de bi rêya perwerdehiya govenda Efrînê hemû Efrîniyên ku li Stenbolê belav bûne û haya wan ji hev nîn e kom dike û dibe sedema hevnasîn û civatên nû. Komê, ew yek ji xwe re kiriye armanç ku her li kî derê be heta ji deştê wan bê û hatiye çanda Kurdî zindî bihêlin. KURDISTAN 24

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Du kolberên Kurd bi sedema teqeya hêzên leşkerî birîndar bûn

Roja Dûşemî 15`ê Xermananê, du kolberên Kurd ên bi navên “Sidîq Tikabî” temen 55 salî û “Xebat Sadiqî” temen 20 salî û xelkê bajarê Seqizê, bi sedema teqeya rasterast a hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê “Birwêşkanî” yê ser bi bajarê Baneyê, birîndar bûn.

Hêzên leşkerî bi bê agehdarkirina berê ew du kolberane digel hejmarek din ji kolberan bi awayê rasterast dabûne ber gulleyan. Ew du kolberane bo çareserîya pizîşkî bo nexweşxaneyê “Selahedîn Eyûbî” ya bajarê Baneyê û nexweşxaneyê Seqizê hatine veguhestin.

Heyama binçavkirina “Îbrahîm Tarîmuradî” hate demdirêj kirin

Roja Yekşemî 14`ê Xermananê, taya 2 a lipêrsa dadgeha şoreş a bajarê Sineyê, heyama binçavkirina welatîyê Kurd ê bi navê “Îbrahîm Tarîmuradî”, temen 55 salî, kurê Mihemed Salih û xelkê gundê “Emrole”yê ser bi bajarê Sineyê, bo heyama 20 rojên din demdirêj kirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, ew welatiye li heyama binçavkirinê de, li “çavpêkevtin digel malbata xwe” û “deştîragihîştin bi parêzer”, hatiye bêparkirin.

Şeva Şemî 2`ê Gelawêjê, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî êrêş kiribûne ser mala wî welatîyî û piştî vekolîna mala wî, navbirî binçavkiribûn.

Hêzên ewlehî di dema vekolîna mala “Îbrahîm Tarîmuradî” de hinek ji kereştîyên wî ên kesîn digel xwe biribûn.

Heya dema belavbûna wê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wî welatîyî de hatiye sepandin ti zanyariyek ji ber deşt nîne.

Kolberekî Kurd li encama teqeya hêzên leşkerî canê xwe ji deşt da

Roja Yekşemî 14`ê Xermananê, kolberekî Kurd ê bi navê “Mihemedxalîd Ebdulazade”, temen 41 salî û xelkê bajarê Pîranşarê li encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê “Hacî Omran” ê girêdayê wî bajarî, canê xwe ji deşt da.

Hêzên leşkerî yên hikûmetê, bi bê agehdarkirina berê teqeya rasterast li wî kolberî kiribûn.

Heya niha termê navbirî bi malbata wî nedane.

“Mihemedxalîd Ebdulazade”, xêzandar û xwediyê du zarokan e.

Cezaya girtîgehê bi ser “Şêrko Tabinak” de hate sepandin

Taya 101 a dadgeha keyferî ya bajarê Bokanê bi serokatîya dadwer “Peyman Roştêmî” welatîyekî Kurd ê bi navê “Şêrko Tabinak”, bi 5 meh girtîgeha te`izîrî û 7 meh girtîgeha ragirtî hate cezakirin.

Dadgehê ew welatîyê Kurd bi tohmata “piropagende li dijî nizamê û bi qazancê yek ji Partiyên Kurd ên dijberî hikûmeta Îranê” tawanbar kiriye û cezaya wî di çend rojên derbasbûyî de bi navbirî hatiye ragihandin.

Ew welatiye li roja Yekşemî 27`ê Pûşperê, bi danîna barimteyê bi awayekî demkî heya bi dawîhatina qonaxên dadgehîkirinê ji girtîgeha îdareya Îtla`ata bajarê Bokanê hatiye azadkirin.

Roja Çarşemî 23`ê Pûşperê, hêzên ewlehî bi bê nîşandana ti belgeyeke yasayî ew welatiye binçavkiribûn.

Pênc meh girtîgeh bi ser “Celal Wefayî” de hate sepandin

Welatîyekî Kurd ê bi navê “Celal Wefayî”, kurê hacî Umer û xelkê bajarê Bokanê, ji aliyê taya 101 a dadgeha keyferî ya wî bajarî bi serokatîya dadwer “Peyman Roştêmî” ve bi 5 meh girtîgeh hate cezadan.

Dadgehê ew welatiye bi tohmata “piropagende li dijî nizamê”, tawanbar kiribû û cezaya wî li heyama rojên derbasbûyî de bi navbirî re hatiye ragihandin.

Roja Yekşemî 27`ê Pûşperê, “Celal Wefayî” bi danîna barimteya 300 milyon Tumenî, bi awayekî demkî heya qonaxa dadgehîkirinê ji girtîgeha îdareya Îtla`ata bajarê Bokanê hatibû azadkirin.

Roja Pênşemî 24`ê Pûşperê, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî êrîş kiribûne ser mala wî welatîyê û piştî vekolîna mala wî, navbirî binçav kiribûn.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (405)

MALAVA XWERAGIR

